


Enwer Ozkahraman

## SPAS JI BO ALÎKARÎYA WAN

Aydin Batur
Beroj Mukrîyanî
Bîlal Guldem
Bîrgun Uzûm
DÎHA
Enwer Ozkahraman
Fatma Durman
Ferhat Arslan
Helbest Çetîn
Mazlûm Sîyabend
Mûrat Adiyaman
Nîhat Oner
Yucel Albayrak

TÊKILÎ
folklorame@gmail.com
folklorame

Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsîyar e.




**Kovara folklorê ya sê mehane**
**Sal:** 3
**Hejmar:** 12
**Xwedî:** Li ser navê Weqfa Mezopotamyayê, Selîm Olçer
**Berpirsa Nivîsan:** Gevrîye Atli
**Edîtor:** Eşref Keydanî
**Redaksîyon:** Evîndar Şevîn
**Desteya Weşanê:**
Celîlê Celîl
Bêrîvan Matyar
Elîf Gunduz
Mem Mukrîyanî
Zîya Mukrîyanî

**ISSN:** 2667-6443

**Grafîk:** Mustafa Akbaş
**Fotoyê bergê pêş:** Mûrat Adiyaman
**Fotoyê bergê paş:** Mazlûm Siyabend


**Navnîşan:** Weqfa Mezopotamyayê
Mezopotamya Eğitim Bilim Sanat Sağlık ve Kültür Vakfı İktisadi İşletmesi
Urfa Yolu Üzeri, Serhat Plaza A/blok
Kat: 11 No: 29 Kayapınar/Diyarbakır
**Sertifika No:** 42382

**Çapxane:** Alioğlu Matbaacılık Bas. Yay. ve Kağ. San. Tic. Ltd. Şti.
Orta Mah.Fatin Rüştü Sk. No: 1-3/A Bayrampaşa-İstanbul
Tel: 0212 612 95 59
**Sertifika No:** 16919




# Pirtûka pêşnîyazkirî

## Navê pirtûkê: Ferhenga Devoka Herêma Semsûrê
## Berhevkar: Mehmet Oncu
## Weşanxane: Sîtav




**Mehmet Oncu**

Mehmet Oncu, di sala 1961'an de li Taxa Xarxarê ya Semsûrê, ji dayik bûye. Dibistana seretayî û ya navîn li Semsûrê xwendiye û ji Zanîngeha Anadoluyê, ji Beşa Kargêriyê mezûn bûye. Nivîskar û berhevkar ji sala 1983'an vir de, li ser folklora Kurdî dixebite û bi navê "Hemo Pêşeng" gelek berhem, nivîs û helbestên wî di kovar, rojname û malperan de hatine weşandin. Gotar û nivîsarên wî yên li ser folklora Kurdî jî nemaze di kovarên wekî Zend, Rewşen, Nûbihar, Govend, Çirûsk, Jiyana Rewşen, Kovara W û Tîrojê de weşiyane. Demekê jî di rojnameya Semsûrê de, di quncikê xwe yê bi navê "Kenêrk" de li ser folklor û zargotina Kurdan nivîsî. Nivîskar, zewicî, bavê du keç û kurekî ye.

**Berhem ên Nivîskar**

1. Çîrokên Kurdan-I, Zargotin, Weşanên Doz-2006
2. Çîrokên Kurdan-II Zargotin, Weşanên Doz-2007
3. Gotinên Pêşiyan, Enstîtuya, Kurdî ya Stenbolê-2009.
4. Mêhrimah, Weşanên, Helbest, J&J-2011
5. Ezîze, Weşanên Helbest, J&J-2011
6. Eware, Helbest, Weşanên J&J-2011
7. Yeklo Duklo Dumbazê, Zargotin, Weşanên J&J-2013
8. Meyîr, Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê-2013
9. Cemîle, (Çanda Pêjingeha Herêma Semsûrê) Weqfa Danasîna Adiyamanê-2014
10. Çîrokên Efsaneyî yên Kurdan, Zargotin- Weşanên Nûbihar- 2014
11. 101 Biwêj 101 Çîrok, Zargotin, Avesta-2015
12. Ferhenga Biwêjan, Zargotin, Weşanên Sîtav-2016
13. Çarîne (Ji Kaniya Dil) Helbest, Weşanên Sîtav-2016
14. Ji Deftera Kurdekî, Aforîzma, Weşanên Sîtav-2016
15. Şihîna hespên azad (roman) Weşanên Sîtav-2017
16. Tiştanokên Kurdî, Zargotin, Weşanên Sîtav-2017
17. 101 Gotinên Pêşiyan 101 Çîrok Nûbihar-2018
18. Serhatî û Serboriyên Kurdan, folklor-2019
19. Guldesteyek Pêkenokên Gelêrî, folklor-2019
20. Kulîlk û Şikevlatû (Fablên Kurdî), folklor-2019



**PÊŞEK**


Li herêma Semsûrê zimanekî gelek xwerû, resen lê ku hîn di asta peyvan de maye heye û di aliyê peyvan de gelek dewlemend e. Dema ku mirov bi baldarî lê bikole diyar dibe ku li herêmê Zimanê Kurdî bi hemû taybetî û bedewkariya xwe tevî hûrgiliyên ku di nav zimên de hene, di nav gel de dijî û heyîna xwe diparêze.

Li herêmê zaravayê sereke Kurmancî ye, belam navçeyeke Semsûrê ya kevn ku bi navê Gergerê tê zanîn tevî gelek gund û bajarokên derdora xwe bi zaravayê Dimilkî dipeyive. Di Kurmanciya herêmê de di aliyê peyvên Kurmancî de bi sedemên bingehîn bandoreke zaravayê Dimilkî ya berbiçav heye, ji wê ye ku li herêma Semsûrê gelek peyvên Kurmancî û Dimilkî hevpar in. Peyvên wek mange, rawêrîn, rind çend peyv ji wan in.

Li herêma Semsûrê hemû gund û war li ser til, gir û girikan hatine şênkirin, di vê mijarê de mirov dikare bêje li herêmê gund an warên ku nû hatine avakirin gelek kêm in an jî tune ne. Beşek ji war û gundên li herêmê hîn ji şaristaniyên Koma û Komageneyê kevntir in, ku navên wan di serdema Hûrî û Mîtaniyan de hatine danîn, îro jî ew gundên bi wî rengî wan navên xwe yên kevn û qedîm diparêzin, ji van navan "Xarxar[1]" navekî Asûrkî ye, Melîte, Elifî, Ûrguç, Kurdîg, Horik navên Eşîrên Hûrî û Mîtaniyan in.

[1] Xarxar ne wargeheke kevn e, belê li pêşiya bajarê qedîm Pereyê deverek e û wekî dever navê kevn e.

7



# Naverok

6 Çar bira, **Mîr Mûhargînî**
11 Hin îdyomên Erxenîyê-3, **Eşref Keydanî**
14 Şev ritla roj xumkarî, **Kurdjan Sorî**
18 Pîrê û dîk, **Zeyneb Yaş**
20 Dîk û pîrê, **Mehpûs Serhedî**
24 Çend mamik ji Agirîyê, **Firat Keklîk**
26 Du meselok ji Licêyê, **Payîz Tursun**
28 Beq û mêrik, **Elîf Gunduz**
30 Esmer Perî, **Asmîn Ûyanik**
35 Şîna mûrmûrkê, **Eskerê Boyîk**
38 Du kilam ji eşîra bêrtîyan, **Helbest Çetîn**
42 Keçkosî, **Amîne Aktaş**
46 Xaçepirsa folklorê, **Oktay Altûn**
48 Folklor û destpêka xebatên folklora kurdî, **Ahmet Seyarî**
57 Nani patîle, **Şehrîban Matyar&Zelal Agar**
59 Du beytên Colemêrgê, **Yûsif Hêşetî**
64 Diz û siltan, **Zîya Mukrîyanî**
70 Şabînok, **Yasemîn Elban**
75 Serhatîya kiça paşa, **Jîyan Ozkan**

# Ji edîtorî

“Di van rojên kelegerm yên havînê da, tiştek heye ku dilê mirovî hênik bike?” Ku pirs û gazinca we ev be, bersiveka me heye. Belê, heye tiştê ku dilê we hênik bike. Folklora Me, hejmara nû çap bû. Hejmara 12an xemila xwe girêda û hat mala we. Dê bi xwendina wê; dilê we hênik, canê we sivik, rûyê we geş û bêhna we fireh bibe. Li xemxur û kedkar û xwîneran pîroz û bimbarek be. Wekî ku dayikên kurd dibêjin *“Hezar carî ser xêrê be Rebbî.”*

Gotineka me ya pêşîyan heye ku dibêje, *“Nîşana baranê ba ye, ya mirinê ta ye.”* Di nivîsên edîtoryal da jî nîşana gazinc û lomeyan, dayîna mizgînîyê ye. Piştî ku me mizgînî da we, îcar em dikarin çend gotinan li ser babetekê bibêjin. Ji berhevkar û amadekarên folklorê ricaya me ew e ku dema diçin berhevkarîyê û tiştan qeyd dikin bila hay jê hebin ku jîyan û serhatîyên stranbêj, beytbêj, zarbêj û dengbêjan jî herî kêm bi qasî teksta/metina ku berhev dikin û lê dikin giring e. Çimkî ev kesên navborî, veguhezêrên çand û keleporê ne. Jîyan û serborîya wan, bivênevê reng dide agahîyên ku neqil dikin. Loma jî di pêvajoya berhevkarîyê û amadekirina nivîsan da, heta ji we tê agahîyên berfireh bidin derbarên van kesan da. “Ka ji kîjan eşîrê ne, keresteya xwe ji kê girtine, çend zarokên wan hene, di bin tesîra kê da mane, di dewra wan da kesên ku ev kar dikirin kî bûn, ji kengî ve ye li cihê lê ne dijîn û hwd.” Ev pirsên ha, dê rê li ber gelek agahîyên berfireh vekin, û bi xêra van agahîyan jî dê karê me rasttir û profesyoneltir be. Ku mirov di wextê xwe da, van agahîyan qeyd neke û nenivîse paşê mirov bixwaze jî bi destê mirovî nakeve. Loma jî di wexta xwe da pirsên xwe bikin û derbarê zarbêj, stranbêj, beytbêjên xwe da jînenîgarîyeka baş binivîsin û li metina xwe zêde bikin.

Piştî lomeyê dîsa em kêfxweş û serbilind in bi xebata Zankoya Zaxoyê. Zankoya Zaxoyê di 11-12ê Gulanê da li Zaxoyê 6. Konferansa Folklora Kurdî li dar xist û gelek vekoleran vekolînên xwe tê da pêşkeş kirin. Mala wan ava be û aqibet li xebatên baştir û vekolînên çêtir be.

Di vê hejmarê da me du guhertoyên meseloka/çîroka “Pîrê û dîk/Dîk û pîrê” li pey hev dan ku her yek ji wan li herêmeka cuda hatîye berhevkirin. Me li pey hev dan ku ka xwînerên me bi çavên serê xwe bibînin; du çîrokên bi heman navî çawa dikarin ewqas ji hev cuda bibin. Di vê hejmarê da jî ji beşên cihê cihê yên folklorê nivîsên curbicur hene. Danasîna xurekan, xaçepirsa folklorê, gotar û keresteyên ji binbeşên cuda yên zargotina kurdî di binê sîwana vê hejmara da bi cih bûne. Berhevkar û amadekaran hêja; stran, şabînok, meselok, mamik, xebrojk, beyt û îdyom ji xezîneya folklora kurdî pêşkeşî we xwîneran kirine. Berhevkar Amîne Aktaş, Yasemîn Elban û Eskerê Boyîk di vê hejmara nû da, xebatên xwe bi me ra par ve kirin. Em hêvîdar in xebatên wan daîm bin, serê pênûsa wan tûjtir, taqeta wan zêdetir be.



Kar ji me, alîkarî û pişt ji we. Ne me bê xwe bihêlin, ne jî xwe bê Folklora Me bihêlin. Cejna we pîroz, mala we tijî lîloz be.

**Eşref Keydanî**